Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 397 nameronahi@gmail.com 18 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li gundê Aliyan hilberîna sebzeyên havînê





Şêniyên gundewarên Aliyan ên girêdayî bajaroka Girke Legê dest bi çandina sebzeyên demsala havîne kirine.
Şêniyên gundewarên Aliyan ên girêdayî bajaroka Girke Legê zêdetirî debara jiyana xwe li ser çandiniyê dikin.
Îsal jî baran di wextê xwe de nebarî û beşeke mezin ji çandiniya demsala zivistanê zerar dît. Bi taybet genim û ceh zerar dît û bû sedema cotkar ziyanên mezin bibînin. Di van mehên dawiyê de û bi taybet meha gulanê baran gelekî barî û cotkar dixwa-



zin ji şilehiya erd sûdwergirin. Niha destpêkirine sebzeyên bejî diçînin.
Cotkar destpêka meha hezîranê dest bi çandina werzan dikin. Di werzan de zebeş, tirozî û fincik diçînin. Pêdiviya van sebzeyan bi avdaniyê nîne û li bazarên herêmî têne firotin. Her wiha cotkar fêde ji dendikên zebeş û qawînan digrin.
Cotkarê bi navê Ehmed Tehlo yê ji gundê Çîlka anî ziman ku wan ji ber çandiniya demsala zivistanê gelek zerar dîtin û niha dixwazin ji sebzeyên havînê sûdwergirin.
Gazinca Ehmed Tehlo mîna cotkarên dîtir ji bihabûna çandinî û reşandina dendikan heye lê belê ji bo debara jiyana xwe bikin, dîsa jî sebzeyên bejî diçînin...*ANHA*

## Ked zêde ye, heqdest kêm e



Cotkarên bajarokê Xurmatûyê tevî ked û westandineke zêde jî heqdesta xwe nagirin û genimê xwe bi feydeyeke kêm difiroşin hikûmetê.
Hikûmeta Iraqê biryar daye ku îsal genimê cotkaran li herêmali bajaroka Xurmatûyê ya ser bi Seleheddînê li Embara genim kom bikin. Hikûmet ji bo her tonek genim 560 hezar dînarê Iraqê diyar kiriye lê, cotkar ji vê yekê nerazîne.
Ji bo genim ji cotkaran were girtin divê 15-20 roj di dorê de bimînin. Ji bo kiriya rê jî heya dora wan tê divê her cara ku tên 50 hezar dînar xerç bikin. Ev jî ji fêdeyê zêdetir zirerê dide cotkaran.
Cotkarê binavê Merîwan Hemîd ku bi xwe xelkê Xurmatûye diyar kir ku ev 15 roje di dorê de ye û got: "Ev zêdetirî 15 roje ez di rêzê de sekinîme. Eger ez bertîl (rişwet) bidim wê di rojekî de genimê min bigirin."
Cotkarekî din ê binavê Ezîz Hemîd jî diyar kir ku ew kariye ancax piştî 20 rojan genimê xwe bifiroşe hikûmetê û got, "Me ji bo her şevek 50 hezar dînar kirê dida wesayîtên barhilgir. Ji bo tenê ez bertîl nedim evqas roj li bendê mam. Ger min 400 dolarê Emerîkî daba komîsyona embara genim wê di wextek zûde



genimê min wergirtiban."
Herwiha Hemîd di dewama axaftina xwe de diyar kir ku Hikumeta Navendî ji bo her tonek 560 hezar dînarê Iraqê diyar kiriye. Lê li depoya genim 530 hezar dînar didin cotkaran. Hemîd diyar kir ku wan îsal genimê xwe hemû bi zerer firotiye û ti fêdeyek ji wan re çênebûye.
Rêveberê Embara genim ya Xurmatûyê Muhendîs Eqil Ehmed jî îda kir ku ji ber cotkarên Xurmatûyê li gorî plana ku hatiye danîn tevnagerin pirsgirêk rû dide û neçar dimînin ku zêde di dorê de bimînin.
Ehmed têkildarî bertîl girtinê jî diyar kir ku ew ê mijarê di derbarê karmendên embara genim de bidin dest pê kirin...*ROJNEWS*

## Bajarê Anî Antîk eleqeyek mezin dibîne



Bajarê Anî Antîk ê li navçeya Arpaçay a Qersê ye, hê jî mîmariya xwe ya kevn diparêze û rastî eleqeyek mezin a turîstan tê.
Anî Antîk a li nêzî navçeya Arpaçay a Qersê ye û li sînorê Ermenîstan-Tirkiyê ye, di navbera salên 961-1014'an de ji gelek şaristaniyan re paytextî kiriye.
Bajarê Anî Antîk ê gelek berheman bi xwe re dihewîne, di 15'ê Tîrmeha 2016'an de ket lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCO. Di nav şaristaniyên ku bajarên antîk jê re malovanî kiriye Sakarlar, Sasanî, Qraltiya Bagratli, Bîzansî, Begtiya Şeddat Ogullari, Anî Gurcî Atabeyleri, Dewleta Harzemşah, îlhanî, Selçuqî, Karakoyunî, dewleta Osmanî û Rusya heye.
Bajarê antîk ku şopa gelek çandan lê heye, rastî eleqeyek mezina turîstan tê. Medreseyên li bajarê antîk ji nû ve tên restorekirin û kevirên ji dêr û medreseyan dikeve jî ji nû ve tên parastin.
Ji roja hatiye avakirin heta niha ji 23 şaristaniyan re malovanî kiriye û di heman demê de Pira Îpekyolu jî di nav xwe de dihewîne...
*JINNEWS*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 397 18- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

### Bila dagirker ji Babê derkevin



Artêşa Tirk ya dagirker li herêmên bakurê Sûriyê yên ku dagirkiriye li ser welatiyan zilm û zordariyê dimeşîne. Welatiyên Babê yên ku ji ber zilma dewleta Tirk ji cihên xwe derketine û li Şehbayê bi cih bûne diyar kirin ku welatiyên li Babê ji ber kirinên artêşa Tirk di rewşên zehmet de dijîn.*R-6*

# BERÊ KURDAN LI QENDÎLÊ YE



### FAŞÎZM ÊRÎŞÎ KURDAN DIKE

Dewleta Tirk ya dagirker û hikûmeta wê ya faşîst bi her awayî êrîşî kurdan û desketiyên wan dike. Hikûmeta AKP'ê ya faşîst ji bo ku emrê desthilatiya xwe dirêj bike li rojava, bakur û başûr êrîşî kurdan dike. Niha jî di bin êrîşa li dijî Qendîlê de êrîşî başûrê Kurdistanê dike. Hizba bi navê PDK'ê jî weke her car piştgiriyê dide van êrîşên dagirkeriyê.

### QENDÎL HEMÛ BAŞÛR E

Gelê Kurd jî li çar aliyan li dijî van êrîşên dewleta tirk ya dagirker xwedî yek helweste û berê xwe didin çiyayê Qendîlê. Eniya Neteweyî li başûrê Kurdistanê li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk bi heyeta KNK'ê re berê xwe da Qendîlê. Ciwanên Enternayonal jî ên ku bi armanca piştgiriyê bidin çalakiyê çûbûn Silêmanî ber bi Qendîlê ve dest bi meşê kirin. *R-5*

### Şervanên QSD'ê Dişîşa rizgar kirin




Di çarçoveya Pêngava Bagera Cizîrê de ku 3'ê Hezîranê ji nû ve dest pê kir, şervanên QSD'ê berê xwe dan bajarokê Dişîşa û gundên li derdora wê. Bajarokê Dişîşa li başûrê Hesekê cihê herî dawî ye ku ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatibû dagirkirin. Şervanan bajarokê Dişîşa bi temamî ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij kirin. *R-2*

### Aqûbeta cenazeyan ne diyar e



Aqûbeta 265 cenazeyên ku di 19'ê Kanûna 2017'an ji şehîdgeha Xerzanê hatin derxistin ne diyar e. Malbatên cenazeyan bertek nîşan dan û diyar kirin ku ti dînî de zilmeke wiha tune ye. Malbatan gotin, "Em hestiyên xwe dixwazin. Hestî li kû bin divê bidin me. Her ku em dibêjin aştî, desthilat ji bo desthilatiya xwe şer geş dike." *R-2*

### Emê heta dawiyê başûr biparêzin



Fermandara YJA STAR'ê Sorxwîn Zagros derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û berxwedana gerîla ya li dijî dagirkeriyê diyar kir ku wê dagirkirina başûr ne hêsan be. Zagros got, "Gerîla xwedî hunera şer û ezmûna bi salan e. Em ê heta dawiyê li ber xwe bidin û gelê xwe û Başûrê Kurdistanê biparêzin. *R-3*

### Jinên Kurd serhildêr in

Endama Rêveberiya Kongreya Star Arjîn Firat diyar kir jinên Kurd di her qada jiyanê de li dijî faşîzm û desthilatdaran serkeftin û destkeftiyên mezin bi dest xistiye û got, "yek jê mînaka lehengên jinên Kurd Sema Yuce ye. Jinên Kurd serhildêr in. Tu carî serê xwe li ber dijmin netewand û ew ê netewînin." R-3

### Dewleta Tirk li Efrînê êrîşî jinan dike


Dewleta Tirk a dagirker li Efrînê kirinên xwe yên hovane bê navber didomîne. Jinên ji Efrînê ku ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk koçber bûne û niha li Şehbayê di kampan de dimînin diyar kirin ku dagirker bi taybet êrîşî jinan dikin gotin, "Emê heta dawiyê têkoşîna xwe bidomînin ta ku Efrîn rizgar bibe." R-3

### HPG'ê li Amed û Colemêrgê li dagirkeran da




Şerê di navbera hêzên gêrîla û artêşa dagirker a Tirk de bi dijwarî berdewam dike. Di van şeran de gêrîla derbên giran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê tekildarî şerê li Amed û Colemêg û daxuyaniye weşand û diyar kir ku 20 leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

### Leşkerên dagirker li Efrînê zeviyan dişewîtinin



Artêşa Tirk a dagirker li Efrînê kirinên der mirovî bedewam dike. Zilm, talan, şewitandin, kuştin û revandin li Efrînê didome. Hat ragihandin ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li navçeya Şêrawa ya Efrînê agir berdan zeviyên gundiyan. *R-2*

### Li Babê komên çete bi hev ketin



Aramî ti carî nayê herêmên bakurê Sûriyê yên ku dewleta Tirk dagirkiriye û dizî û talanî lê bi dawî nabe. Çete her roj li ser mal û milkên welatiyan bi hev dikevin. Li bajarê Babê di navbera komên çete yên girdayî Artêşa Tirk de şer derket. Di encama şer de ji herdû aliyan birîndar hene. *R-2*

### Bav û 2 birayên wî kuştin, ew jî girtin


Rêjîma faşîst a AKP'ê bi piştgiriya dadger û dozgerên xwe li dijî Kurdan êrîş û terorê berdewamdike. Bi nêzîkbûna hilbijartinan re bi darê zorê deng ji kurdan dixwaze. Fadil Şenyaşar ê bav û 2 birayên wî ji aliyê zilamên wekilê AKP'ê Îbrahîm Xelîl Yildiz ve hatin kuştin ew jî birîndar bûbû, dema ji nexweşxaneyê derket, hat destgîrkirin û piştre hate girtin. *R-2*

### Em ê ji sekna xwe venegerin



Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş, ji rojnameya Le Monde ya Fransayê re gotarek nivîsî û diyar kir ku ew li ser daxwaza Ergogan hatiye girtin û wiha got, "Berdêla xwe çi dibe bila bibe, bi navê xwe, ez ê ti carî ji sekna xwe ya mûxalîf a ji bo gelê xwe venegerim." *R-5*

### Xêra dewleta Tirk ji başûr re tune ye



Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn diyar kir ku armanca êrîşên dewleta Tirk li ser başûr ne tenê gerîla ye, li ser hemû Başûrê Kurdistanê gefa dagirkirinê heye. Engîn wiha got, "Di referandûma başûr de jî rastiya dewleta Tirk careke din hat dîtin. Ji bo faşîzmê Kurdê baş Kurdê mirî ye. Ji bo vê divê Kurd hemû li ber xwe bidin û yekîtiya xwe ava bikin." *R-4*

### Emê lîstika qirêj xera bikin



HDP mîtîngên ji bo hilbijartina 24'ê Hezîranê didomîne. Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Cizîrê beşdarî mîntîngê bû. Temellî di mîtînga Cizîrê de axivî û got, "Heke HDP di 24'ê Hezîranê de bi ser bikeve, ew ê pêşiya Tirkiyê were vekirin. Em ê lîstika qirêj bi hev re xirabikin. Em ê bi teqez bi serkevin." *R-5*

### Tirs ketiye nava dilê dewletê



Parlamenterê HDP'yî Mîthat Sancar diyar kir ku Bi rijandina xwînê, bi derew û destesekirinê desthilatdarî bi rê ve naçe û wiha got, "Hebûna vê desthilatdariyê derewîn e. Ji bo HDP li bendê bialiqe çi ji destê wan tê dikin. Tirsa HDP'ê ketiye dilê hemû kadroyên dewletê." *R-4*

# Şervanên QSD'ê Dişîşa rizgar kirin

***Di çarçoveya Pêngava Bagera Cizîrê de ku 3'ê Hezîranê ji nû ve dest pê kir, şervanên QSD'ê berê xwe dan bajarokê Dişîşa û gundên li derdora wê. Bajarokê Dişîşa li başûrê Hesekê cihê herî dawî ye ku ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatibû dagirkirin. Şervanan bajarokê Dişîşa bi temamî ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij kirin.***




Şervanên QSD'ê piştî şerekî dijwar herêmek ji 8 kîllometreçargoşeyî ji çeteyên DAÎŞ'ê paqijkirin û xwe gihandin nava bajarokê Dişîşayê.
Di çarçoveya Pêngava Bagera Cizîrê de ku 3'ê Hezîranê ji nû ve dest pê kir, şervanên QSD'ê berê xwe dan bajarokê Dişîşa û gundên li derdora wê.
Şervanan bajarokê Dişîşa bi temamî ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij kirin.
Piştî ku şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD ketin nava bajarokê Dişîşa şerekî dijwar dest pê kir. Gelek sivîlên ku ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve weke mertalên zindî dihatin bikaranîn, hatin rizgarkirin.
Bajarokê Dişîşa li başûrê Hesekê cihê herî dawî ye ku ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatibû dagirkirin.
Şervanên QSD'ê piştî rizgarkirin bajarok dest bi paqijkirina herêmê ji mayin û bermahiyên çeteyan kirin.
Çeteyên DAÎŞ'ê piştî ku li Sûriye û Iraqê derbên giran xwar û têk çû, Dişîşa ji bo xwe weke baregehekê bi kar dianîn û gelek serçete lê bûn. Dişîşa li ser sînorê Iraq û Sûriyeyê weke navendeke girîng a DAÎŞ'ê bû.

## HPG'ê li Amed û Colemêrgê li dagirkeran da



HPG'ê diyar kir ku li Şemzînan û Çelê 16, li Amedê jî 4 leşker hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê tekildarî şerê li Amed û Colemêgê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de hêzên me di 16'ê Hezîranê de li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakî li dar xistine.
Saet di 02.00'an de hêzên me li dijî yekîneyeke artêşa Tirk a dagirker a li Tepê Xîreta ya Şemzînana Colemêrgê çalakiyeke sabotajê li dar xistiye. Di vê çalakiyê de bi qasî ku hatiye tespîtkirin 2 leşkerên dijmin hatine kuştin.
Hêzên me saet di 15.00'an de li dijî leşkerên dagirker ên li Xirê Xeregolê yê Çelêya Colemêrgê çalakiyek li dar xistine. Di vê çalakiyê de hêzên me li çeper û stargehên dijmin dane û bi qasî ku hatiye tespîtkirin 14 leşkerên dijmin hatine kuştin.
Di 11'ê Hezîranê de saet di 17.30'an de artêşa Tirk a dagirker li qada Dêrxustê ya Licêya Amedê operasyonek daye destpêkirin. Hêzên me li dijî yekîneyek veşartî çalakiyek li dar xistine. Di vê çalakiyê de bi qasî ku hatiye tespîtkirin 4 leşker hatine kuştin.

## Aqûbeta cenazeyan ne diyar e



Aqûbeta cenazeyên ku ji Xerzanê hatin derxistin ne diyar e. Malbata Muzeyyen Gordemîr ji bo ku hê encamek bi dest ve neaniye xwedî helwest e. Malbat dibêje, "Di kîjan dînî de zilmeke wiha heye."
Li gundê Oleka Jor a Tetwana Bedlîsê, ji Goristana Xerzanê 19'ê Kanûna 2017'an 267 cenaze hatin derxistin û aqûbeta 265 cenazeyan nayê zanîn. Ji 267 cenazeyên ku birin Tiba Edlî ya Stenbolê tenê cenazeyên Dîlan Bîngol û Celal Ovmen piştî 61 rojan dane malbatê, nayê zanîn bê ka 265 cenazeyan kengî bidin malbatan.
Malbata Muzeyyen Gordemîr (Bêrîvan) û malbatên dî ji bo cenazeyên xwe bistînin têkoşîna hiqûqî didin.
Xwîşka Gordemîr Şukran Sîncar got ti maneyeke hiqûqî û însanî tine ku cenaze ji goristanê derxînin, diyar kir, ji bo ku cenaze bistînin meha Remazanê tim dua kirine û got, "Ji bo me ti maneya cejnê nemaye. Ev cejn jî wiha derbas bû. Daxwaza min ew bû ku Cejna Remazanê li ser gora xwîşka xwe dua bikim. Nebû. Me ne hestiyên wê dîtin û ne jî me karî em biçin ser goristanê."
Sîncar got xwîşka wê 1993'yan jiyana xwe ji dest daye û got, "Dema xwişka min şehîd ket, me bi salan nizanibû ka cenazeyê wê li kû ye. Piştî goristana Xerzan hat avakirin em gihiştin cenazeyê xwişka xwe. Gorek ku em li ser dua bikin çêbû. Lê destûr nedan ku em li ser cenazeyan dua bikin û hemû cenaze ji goristanê derxistin û birin. Berpirsê vê yekê kîye divê bê darizandin."
Sîncar anî ziman ku wan piştî cenaze ji Goristana Xerzanê hatin derxistin mînaka xwînê dan û wiha got: "Êdî bes e. Me 3 meh berê xwîn da Saziya Tipa Edlî. Me mînaka DNA'yê da. Em hestiyên xwe dixwazin. Hestî li kû bin divê bidin me. Her ku em dibêjin aştî, desthilat ji bo desthilatiya xwe şer geş dike."

## Polîsan êrîş kirin: 40 kes hatin destgîrkirin

Endamên KESK'ê yên ku bi armanca vegera karê xwe ku ev 70 heftene di nava çalakiyê de ne, polîsan êrîşî çalakiya wan kirin. Di çalakiyê de 40 kes hatin destgîrkirin.
Endamên Federasyona Sedîkayên Kedkarên Cemawerî yên bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de (BHQ) ji kar hatine dexistin, ji bo vegerin karê xwe çalakiya xwe ya dabû destpêkirin di hefteya 70'yî de dom kirin. Endamên KESK'ê yên li Qada Altiyol a li navçeya Kadikoyê kom bûn, pankarta 'Em ê li karê xwe vegerin' vekirin, li vir xwestin daxuyaniyek bidin. Polîsên ku rê nedan kedkaran, êrîşî çalakvanan kirin û 40 kedkar destgîrkirin.

## Bav û 2 birayên wî kuştin, ew jî girtin

Fadil Şenyaşar ê bav û 2 birayên wî ji aliyê zilamên wekilê AKP'ê Îbrahîm Xelîl Yildiz ve hatin kuştin ew jî birîndar bûbû, dema ji nexweşxaneyê derket, hat destgîrkirin û piştre hate girtin.Li navçeya Pirsûs a Rihayê xizmên namzetê AKP'ê êrîşî dikandaran kiribû û di êrîşê de Fadil Şenyaşar yê ku di êrîşa AKP'yiyan de bav û 2 birayên wî hatibûn qetilkirin, dema ku ji nexweşxaneyê hate derxistin, hat destgîrkirin. Şenyaşar derxistin edliyeyê û hate girtin.Wekîlê AKP'ê yê Rihayê Îbrahim Xelîl Yildiz û zilamên xwe di 14'ê Hezîranêde bi ser dikana esnaf Şenyaşar de girtin û gule li bav Haci Esvet Şenyaşar û kurên wî Adîl, Celal û Fadil Şenyaşar barandibûn. Dema bav Esvet û kur Adil û Celal rakirin nexweşxaneyê, zilamên Wekîlê AKP'ê bav û 2 kur li nexweşxaneyê kuştin. Fadil Şenyaşar ê bav û 2 birayên wî hatin kuştin piştî dermankirina wî qediya û ji nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Gazi Yaşargil a Amedê derket, ji aliyê polîsan ve hat destgîrkirin.
Fadil Şenyaşar dema sewqî edliya Rihayê kirin, ji aliyê dadgehê ve hat girtin û şandin girtîgehê.

## Li Babê komên çete bi hev ketin



Li bajarê Babê di navbera komên çete yên girdayî Artêşa Tirk de şer derket. Di encama şer de ji herdû aliyan birîndar hene.
Li gor nûçeya di ajansa ANHA'ê de di navbera du komên çete yên girêdayî artêşa dagirker a Tirkiyê de li bajarê Babê şer û pevçûn rû dan û di encamê de gelek çeteyên herdu aliyan birîndar bûn.Tê gotin ku pevçûn li nêzî nexweşxaneya El-Hikmê li ser benda kontrolê ya çerxeriya El-Ezreq di navbera koma çeteyan a El-Şerqiyê û çeteyên asayîşa artêşa azad de rû dane. Sedema pevçûnan jî ew e ku welatiyekî sivîl li ba asayîşa artêşa azad gilî kiriye ku li ser vê bendê welatî tên şêlandin.
Hat ragihandin ku di encama pevçûnên di navbera herdu aliyan de gelek çete birîndar bûne û yên birîndar bûne rakirine nexweşxaneya El-Hikêm.
Çeteyên koma El-Şerqiyê hewldan birîndarên xwe ji nexweşxaneyê derxînin û li ser vê yekê jî di navbera herdu aliyan de li pêşiya nexweşxaneyê pevçûn careke din rûdan û koma El-Şerqiyê nikaribû çeteyên xwe yên birîndar ji nexweşxaneyê derxîne…*ANHA*

## Leşkerên dagirker li Efrînê zeviyan dişewîtinin



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li navçeya Şêrawa ya Efrînê agir berda zeviyên gundiyan.
Li gor çavkaniyên herêmî ku ragihandin artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê agir berda zeviyên ceh û genim ên welatiyên navçeya Şêrawa ya Efrînê û rûbereke fereh şewitî.
Ji destpêka ku dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê Efrîn dagir kirine ve, dagirker nahêlin ku welatî nêzî zeviyên xwe bibin û zeviyên wan desteser kirin û şandin Tirkiyê…*ANHA*

## Artêşa Tirk li dijî çiyayê Cûdî êrîş destpê kir



Artêşa Tirk a dagirker li herêma Cûdî ya Şirnexê bi desteka hewayî dest bi êrîşê kir.
Li gorî agahiyên ku çavkaniyên herêmî ragihandin, artêşa Tirk a dagirker li Girê Çolya û derdora wê dest bi êrîşê kiriye.
Hate gotin, êrîş bi desteka hewayî tê kirin û hin cerdevan jî tevlî bûne.
HPG'ê hîn li ser mijarê daxuyanî nedaye…*ANF*



# Parastina çand, ziman û dîrokê

***Endama Desteya Turîzm û Parastina Şûnwaran a Hesekê Rena Esead diyar kir ku êrîşeke sîstematîk li ser çand û zimanê kurdî heye û got, "gelê kurd li hember polîtîkayên bişavtinê divê li ziman, çand û dîroka xwe xwedî derkeve."***



Endama Desteya Turîzmê û Parastina Şûnwaran a Hesekê Rena Esead bal kişand ser çand, huner, ziman û dîroka Gelê Kurd û êrîşên li ser nirxên pîroz û got: "Divê ji bo nasname û têkoşînek mayinde em xwedî li nirxên xwe yên giranbiha derkevin. Lewra parastina çand û dîrokê parastina hafizaya civakî ye."
Endama Desteya Turîzmê û Parastina Şûnwaran a Hesekê Rena Esead diyar kir ku li her çar parçeyên Kurdistanê êrîşên tund li ser çand, huner, ziman û dîroka Gelê Kurd hene û anî ziman ku divê gelê Kurd bibin yek û rê nedin pişavtina ku tê xwestin li ser Gelê Kurd bê kirin.
Rena Esead da zanîn ku yên mirovan ji pişavtinê xelas dike nirxên wan ên pîroz in û ev nirx jî çand, huner, ziman û dîrok in û got: "Li Efrînê dewleta tirk û çeteyên wê êrîşî cihên dîrokî kirin ku pişavtina li ser Gelê Kurd pêk were. Ev ne tenê li Efrînê li çar aliyê Kurdistanê bi awayekî sîstematîk tê kirin ku Gelê Kurd ji çanda xwe ya kevnar û ji nasnameya xwe dûr bikeve. Ji bo vê yekê jî komên çete yên wekî DAÎŞ'ê bi kar tînin. DAÎŞ a ku li Kobanê êrîşî nirxên gelê Kurd kir niha di bin qilifê Artêşa Azad de dîsa êrîşî nirxên pîroz ên gelê Kurd dike. Divê em destûrê nedin vê yekê ku em ji nasnameya xwe dûr nekevin."
Renayê da zanîn ku êrîşên li ser nirxên gelê Kurd li pêş çavên cîhanê tê kirin û got: "Divê em dîroka xwe û neyarên xwe nas bikin ku em bizanibin em ê çawa tev bigerin. Heger em nizanibin neyar dê bi çi şêwazê êrîşî me bike wê demê em ê nikaribin xwe biparêzin. Lê rêya parastinê jê yek ew e ku em xwedî li ziman, çand, huner û dîroka xwe derkevin. Divê em li nirxên xwe yên pîroz xwedî derkevin û li dijî hemû lîstikan em hişyar bin."
Renayê bi lêv kir ku ji bo çand, ziman, huner û dîroka wan winda nebin ew dixebitin û wiha dawî li axaftina xwe anî:"Rojavayê Kurdistanê ji warê dîrokê de gelek dewlemend e. Tenê li Herêma Cizîrê dora 1043 cihên dîrokî hene. Em meclîsên komînan ava dikin ku ji bo gel di warê nirxên xwe yên pîroz de bibin xwedî agahî. Ji bo gelê me ji ziman, çand, huner û dîroka xwe haydar be niha em hewl didin ku semîner, civîn û perwerdeyan çê bikin. Her wiha komîteyek me ya şopandinê jî heye ku li her bajarî parastina çand, ziman, huner û dîroka xwe bikin. Ez bang li gelê Kurd dikim ku xwedî li ziman, çand, huner û dîroka xwe derkevin."…*JINNEWS*


## Pêdivî û girîngiya Arşîvê



Derwêş M. FERHO

Sedemên ku meriv bibe xwedî arşîvek têr gelek in. Berdestbûna dokumentên derbareyî dîrok, civak, pêvajo, çand, xebat, partî, sazî û kesayetî, …
Heta roja îro me Kurdan, ji sedemên bindestî û şert û mercên dijwar, pirr kêm girîngî daye pêkanîna arşîvên xwe. Yek ji sedemên herî girîng parastina arşîvan bi giştî xeter bû. Derfet jî kêm bûn. Lê ya herî girîng me di vî warî de sersarî kiriye.
Lê gel û civakên din girîngiyek pirr mezin didin arşîvên xwe. Bi awayekî rê ji bo parastina arşîvên xwe dibînin. Her partî, sazî, kesayetî, gund, şahredarî û wek sîwan jî dewlet xwedî arşîvek rêkûpêk in. Bi vî awayî dîroka xwe ya pirralî diparêzin.
Arşîv ji sê aliyan ve pirr girîng e.
Di warê dîrokî de: awa, pêkhatin û sedemên û zelalkirina bûyerên buhûrî.
Di warê agahdarî/hişmendiyê de: her tim li ber dest in ku ji wan aghadarî were stendin û dibin bingeha hişmendiyê. Dîroka li ser kaxezê nivîsî hunda nabe.
Di warê hiqûqî de: dokumentên tên parastin dikarin bibin sedema zelalkirina gelek çareseriyan. Ew îspat in.
Enstituya Kurdî ya Brukselê girîngiyeke mezin daye arşîfkirina kar û xebatên xwe. Ji roja pêşin heta niha me her tiştê xwe li hev komkirî parast. Lê dîsa em ji xezeba dewleta Turk xelas nebûn. Di Mijdara 1998 de bi fermana rayedarên dewleta Turk êrîşek mezin hat ser Enstituyê û xaniyê me şewitandin. Bi wê êrîşê bi deh hezaran dokumentên me hatin şewitandin. Zêdetir ji 5000 pirtûk bûne xwelî. Me pirraniya pirtûkan bi gelek dijwariyan peyda kir. Pirraniya dokumentan jî me dîsa dan hev. Lê beşekî piçûk hunda bûn. Û ev jî bû sedema ku em dijî vê hovitiya dewleta Turk ku li dervayê welêt jî dibe tedbîr bistînin. Di Cotmeha 1999 de me peymanek bi ADVN (Arşîva Flamanan li bajarê Antwerpen) çêkir. Bi vê yekê saxlembûna cî û parastina arşîf û pirtûkxaneya me qat bi qat zêde dibe. Ji wê demê û vir de em hem li navenda Enstituyê hem jî li ba ADVN arşîva xwe diparêzin. Bi wî awayî em rê li ber malwêraniya ku dewleta Turk sersebeb e digrin. Di heman demê de derfet ji bo lêkolînên li ser mijarên cuda yên derbareyî Kurdistan pêk werin amade dibin. Xwendekarên zanîngehan, rojnamevan û lêkolîner bi rehetî dikarin li van her du ciyan hem ji arşîvê hem ji pirtûkan sûd bigrin. Li gora agahdariyên ku ADVN her sal dide me, heta roja îro zêdetir ji 9000 car zêdetir pirtûk/dokumentên me hatina xwestine û dîtin. Bi van bîr gomanan, min çendîn car ji kes û saziyên me, ji partiyên Kurdistanî re ev pêşniyar biriye. Ji bo em dîroka xwe bi awayekî baştir nas bikin û bibin xwedî agahdariyên saxlem haj ji berhem û belgeytên xwe hebin. Rapor in, peyman in, nivîs in, name ne, wêne ne û gelek tiştên din ku dikarin bibin çavkaniyên girîng. Ji bo vê jî arşîvkirin girîng e.Eger kes, sazî, partî û dezgehên Kurdistanî hez bikin, deriyên ADVN ji wan tevan re vekiriye ku cî ji bo parastina arşîvên wan bide. Di aliyê aborî de jî tiştek nayê xwestin. Bi şertê ku di her dema hat xwestin ew arşîv dîsa li xwediyê xwe yan jî ji dezgeheke Kurdistanî re bi saxlemî vegere. Peymana ku me bi ADVN re nivîsiye li ser wî esasî pêk hatiye.

## Huner bixwe helwesteke



Lîstikvana Kurd Şaî diyar kir ku Wezareta Rewşenbîrî û televziyonên Kurdî giringiyê nadin hunerê û got, "Huner bixwe helwesteke."
Lîstikvana binavê Şaî Reza di sala 1992'an de li bajarê Silêmaniyê ji dayîk bûye. Şaî di zarokatiyê de dest bi hûnera zarîkirinê kiriye. Ji bo vê di temenê xwe yê zarokatiyê de tevlî lîstikên şanoyê dibe û pêngavek mezin di aliyê lîstikvaniya şanoyê de diavêje.
Şaî li gel vê hunera xwe ya zarîkirinê xwendina xwe ji bi awayeke serkeftî derbas dike. Beşa Şanoyê hem li peymangehê hem jî li zankoyê dixwîne.
Herwiha lîstikvan Şaî di gelek rêze film û filmên sînemayî yên Kurdî de jî lîstiye. Ji van filmane di filmê sînemayê yê 'Evîndar bi hevre dimirin'de jî lîyîstiye.
Lîstikvan Şaî di derbarê rola jinan ya di hûnera zarîkirin (texlîtkirin) a li Başûrê Kurdistanê de axivî û diyar kir ku beşdariya jinan a di hunerê de li gorî dema berê zêdetire û got; "Hinek car zilam rola jinan dilîzin. Lê, niha herçend hejmara xwe kêm bin jî êdî jin jî berê xwe didin vê qada hunerê. Hê jî civak tam ne hatiye wê astê ku hebûna jinan a di vê qadê bipejirîne."
Şaî balkişand ser astengiyên di dema karkirinê de derdikevin pêş wan û wiha pêde çû; "Wek her jinek din, astengî li ber karê min jî çêbûne. Lê ne hatiye wê astê ku bandoreke zehf mezin li min bike. Baweriya min bi jinan heye ku hemû astengiyan derbas bikin. Hûner bi xwe helwesteke. Pêwîste civak û rastiya civakê bigre berçavan. Huner jiyana mine."
Di dawiyê de jî lîstikvan Şaî wezareta Rewşenbîrî ya Hikumeta Herêma Kurdistanê û televziyonên Kurdî rexne kir û got; "Wezareta rewşenbîrî û televziyonên Kurdî giringiyê nadin hunerê. Mixabin ev yek jî bandoreke neyînî li berhemên hunerî bikin."…*ROJNEWS*

## Peykerekî ji dema Tewratê hat dîtin



Arkeologan li Îsraîlê peykerekî 3 hezar salî dît û ev bi rastî jî cihê rabûna kela can e, ji ber ji wê serdemê kêm peyker hene ku kalîteya wan a hunerî baş be. Herçî ev peykerê mîna portreyekê ye, şekirina porê wî jî têra xwe balkêş e ji bo arkeologan ku wisa hizir dikin ku ev bustekî melikekî be. Arkeologên ku xwedî vê hizrê ne, nizanin ka ev bust temsîla kîjan melikê serdema kevnar a welatê Kenan dike.
Ev fîgurê 5 santîmetreyan mezin, sala 2017´an li devera bi navê Abel Beth Maacah ku li Başûrê sînorê Îsraîlê bi Lubnanê re hat dîtin. Ji bilî ku riha wî û qismek bêvila wî kêm be, ev peykerê piçûk ê ji serdema Tewratê, di halekî gelekî baş de ye. Ji ber ku tiştekî mîna tacê li ser serê wî heye, lêkolîner difikirin ku ew endamekî xanedana hikumdar be. Lê ka kîjan melik û ji kîjan meliktiyê ye, ti îşaret nînin li ber dest.
Bi her halî ev herêm ciheke ku di navbera Îsraîl û Aram-Şamê de demeke dirêj dest guhertiye û ji ber wê jî muhtemel e ku agahiyên dîrokî yên girîng jî li vir bên vekolîn. Ev peyker ji aliyê arkeologên dildar ve hatibû dîtin û muzeya Îsraîlê di cih de ew xist nav wan berheman de ku pêşan dide. Ji muzeyê Eran Arie dibêje: "Di serdema demir de heger ji hunerê fîguratîf tiştek hebe jî û bi pirranî nîn in, bi her halî ku hebin jî kalîteya wan pir kêm e. Lê herçî ev e, kalîteya wî pirr baş e."…*AMED*

## Xelata Qiloçê Zêrîn dan derhênerê kurd



Derhênerê kurd ê ji rojavayê Kurdistanê, Telal Dêrikî di Mîhrîcana Fîlman a Krakovê de di beşa belgefîman de bi fîlmê xwe yê li ser zarokên di nava şîdet û kuştina DAIŞ´ê de tên mezinkirin ê bi navê 'Ji Bav û Kuran', Xelata Qiloçê Zêrîn wergirt.
Di belgefîlmê de Telal Dêrikî li Sûriyê bi kamerayê çûye nava DAIŞ´iyan û xwe weke alîgirê wan nîşan daye, hevaltiya wan dike. Lewma kariye here meydanên şer û rahênanên wan ên leşkerî bi kamera tomar bike.
Komîsyona Nirxandina Mîhrîcana 58´emîn Mîhrîcana Belgefilman a Krakovê, ji ber vî karê serkeftî, derhênerê kurd weke kesekî bêtirs wiha pênase kir: "Di nava cîhaneke dirinde de mirovekî çavnetirs."
Di 58´emîn mîhrîcanê de wekî din belgefîlmeke din a ji Kurdistanê jî hat pêşkeşkirin. Fîlmê derhêner Hogir Hirorî yê bi navê "Deminer" (Hilkerê Mayinan) ku serpêhatî û lehengiya pêşmergeyê şehîd, Faxir nîşan dide, di mîhrîcanê de hate pêşandan.
Ev fîlm jî ji aliyê temaşevanan ve bi başî hate nirxandin. Piştî pêşandan, der barê fîlmê de ji kesên amade, xwendekaran re minaqeşeyeke hate pêşkeşkirin.
Juriyê der barê fîlmê Telal Dêrikî got ku ew gelekî behsa DAIŞ´ê dikin lê qet xwe nagihînin û derhêner xwe gihandiye wê dinyayê û bi zimanekî derasayî yê sînemayê kariye trajediya wan zarokan vebêje.
Di mîhrîcanê de wekî din xelata Ejderê Ejderan (ejder nîşaneke bajarê Krakovê ne) ji derhêner Sergei Loznitsa re çû ji ber alîkariya wê ya di pêşxistina belgefilman di asta cihanî de…*KRAKOV*

# Bila dagirker ji Babê derkevin

***Artêşa Tirk ya dagirker li herêmên bakurê Sûriyê yên ku dagirkiriye li ser welatiyan zilm û zordariyê dimeşîne. Welatiyên Babê yên ku ji ber zilma dewleta Tirk ji cihên xwe derketine û li Şehbayê bi cih bûne diyar kirin ku welatiyên li Babê ji ber kirinên artêşa Tirk di rewşên zehmet de dijîn.***







Şêniyên herêma Babê yên li Şehbayê dimînin, diyar kirin ku welatiyên Babê ji ber kirinên çeteyên artêşa tirk di rewşeke zehmet de dijîn û bang li aliyên têkildar û hêzên demokratîk kirin ku dagirkeriya tirk û çeteyên wê ji herêmê derxin.
Şêniyên herêma Babê yên li Şehbayê dimînin derbarê kirinên çeteyên artêşa tirk yên ku li hemberî şêniyên Babê pêk tînin, axivîn.
Welatiya bi navê Neyîma El-Hesen ya ji gundê Qebasîn ê girêdayî Babê wiha got: "Çete welatiyan didin koçberkirin, mal û milkên welatiyan didizin û talan dikin. Malan hildiweşînin. Dewleta tirk demografya herêmê diguherîne, çanda xwe li xelkên herêmê ferz dikin."
Neyîma El-Hesen, bang li aliyên têkildar kir ku ji bo derxistina artêşa tirk û çeteyên wê ji Babê û herêmên din ên Sûriyê, têbikoşin û got: "Bila dewleta tirk û çeteyên wê ji herêmên me werin derxistin, da ku em karibin vegerin warê xwe."
Welatiyê bi navê Mihemed El-Ehmed ê ji gundê Til Betal a Babê beriya 3 salan ji ber êrîşên artêşa tirk û çeteyên wê koçber bû. El-Ehmed da zanîn ku dewleta tirk a dagirker çete ji hemû aliyên Sûriyê kom kirin û bi aramanca guhertina demografya herêmê ew li Babê kom kirin û wiha got: "Welatiyên Babê ji ber kiryarên çeteyên artêşa tirk di rewşeke zehmet de dijîn. Rojane welatiyên sivîl direvînin, qetil dikin û îşkenceyê lê dikin. Sivîlan berdin jî beranberî wê pereyan dixwazin."
Welatiyê bi navê Yasir Şêxo yê ji bajarê Babê beriya 6 salan ji bajarê xwe koçber bûye. Yasir da zanîn ku çeteyên bi navê mertala firatê welatiyên sivîl direvînin û qetil dikin û got: "Em jiyana li koçberiyê qebûl dikin û em qebûl nakin di bin zilma wan de bijîn. Em dagirkeriya Tirkiyê jî qebûl nakin."
Şêxo, bang li hemû aliyên têkildar kir ku ji bo derxistina artêşa tirk û çeteyên wê ji Babê, têbikoşin…*ANHA*

## festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan hat lidarxistin



Festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan a Hesen Kiziler ku her sal bi kevneşopî li Swîsreyê tê lidarxistin, îsal jî bi coş û kelecaneke mezin pêk hat.
Festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan a Hesen Kiziler ku her sal bi rengekî kevneşopî ji aliyê Yekîtiya Ciwanên Şoreşger û Tevgera Jinên Ciwan ên Şoreşger ve li Swîsreyê tê organîzekirin, îsal li bajarê Baselê pêk hat. Di vê çarçoveyê de li navenda sporê ya li Allschwilê pêşbirkên futbol û voleybolê hatin lidarxistin û piştre li salona dawetê ya Bûrcû pîrozbahî pêk hat.

**TÛRNÛVAYÊN FUTBOL Û VOLEYBOLÊ**

13 tîm tevlî tûrnûvaya futbolê bûn. Di encamê de tîma Anatolischer Kulturverein Wohlen bû yekemîn, Roj Winthertur bû duyemîn, Terolar jî bû sêyemîn. Di tûrnûvaya voleybolê de tîma Meclîsa Jinê ya Bêrîtan a li Zurichê bû yekemîn.
Piştî tûrnûvaya sporê, şahî pêk hat. Li salonê pankartên bi nivîsa "Bi ruhê Çiyager û Avestayan serî hilde", "Serok azad bike", posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wêneyên Hesen Kiziler, şehîdên şoreşê û alên PKK, YPG/YPJ'ê hatin daliqandin.
Ciwanên ku li Qendîlê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bûne mertalên zindî, bi weşana zindî tevlî çalakiyê bûn û festîvala ciwanan silav kirin.

## Rê xirabin welatî gazincan dikin




Ajokar û şêniyên Dêrikê ya herêma Cizîrê ji ber xirabûna rêyan û zêdebûna kortikan gazincan dikin. Ev demek e ku rêyên dirêj nehatine temîrkirin û ev yek bandorê li tevgera tirimpêlan dike.
Bajarê Dêrikê ji ber ku li ser sînorê başûrê Kurdistanê ye û ji ber ku hemû erebeyên bar ên ji Sêmalka tên û tê re derbas dibin, hemû rêyên wê xirab bûn.
Rêya di navbera Dêrik û Qamişloyê de ku herî zêde xirab bûye, ji ber ku zêde ji aliyê şêniyan ve tê bikaranîn pêwîstiya wê bi sererastkirinê heye. Her wiha rê û kolanên nava bajar jî tijî kortik bûne.
Ne tenê rêyên bajar, lê belê piraniya rêyên gundan jî xirab bûne. Her wiha rêya Sêmalka ya di navbera başûr û rojavayê Kurdistanê de zêde xirab bûye.
Welatiyê bi navê Ziyad Îbrahîm diyar kir ku rê zêde xirab bûne û wiha got: "Şaredariyên rejîmê herêmên kurdan paşguh dikirin lê niha şaredariya gel jî bi erka xwe ranabe û pirsgirêka rêyan paşguh kiriye."
Îbrahîm destnîşan kir ku ji ber xirabûna rêyan erebeyên wan jî xirab bûne û got: "Temîrkirina erebeyan buha ye û ji ber wê pêwîst e em her demekê erebeyên xwe temîr bikin."
Îbrahîm di axaftina xwe de bang li şaredariyê kir ku rêyan sererast bike.
Welatiyê bi navê Silêman Yûsif li ser zehmetiyên şêniyên bajarê Dêrikê di çûn û hatinê de axivî û wiha got: "Di demên berê de me nedixwest ku biçin gundan, ji ber ku rê xirab bûbûn. Lê niha rêyên bajar ji yên gundan xirabtir bûne. Heke şaredarî dest bi karê sererastkirinê neke wê hemû rê ji warê xizmetê derkevin."
Yûsif bang li şaredariyê kir ku pirsgirêka rêyan bi awayekî lezgîn çareser bike.
Hevserokê Şaredariya Gel a Dêrikê Hisên Adem diyar kir ku hemû rêyên gund û bajarê Dêrikê xirab bûne û got, mafê welatiyan e ku gazincan bikin û banga lezgîn bikin. Adem wiha dewam kir: "Ji bo bajar me gelek proje danîne. Yek ji wan sererastkirina rêyan e. Me projeyên xwe ji meclisa kantonê re şandine û em li hêviya êrêkirinê ne da ku em dest bi sererastkirinê bikin."…*ANHA*

## Li El-Erîşa xebatên tenduristiyê




Li navçeya El-Erîşa ya Şedadê xebatên tenduristiyê bi pêş dikevin,
Piştî ku dermanfiroş û bijîşkên navçeya El Erîşa vegeriyan warê xwe xebatên tendurustiyê pêş dikevin.
Ev çend sal e li navçeya Şedadê rewşa xebatên tenduristiyê pir xirab bûbû. Lê di encama xebatên têne meşandin de, bijîşkên navçeyê êdî vedigerin warê xwe û xebatên tenduristiyê bi rê ve dibin.
Navenda Tenduristiyê ya li bajarokê El-Erîşa ya navçeya Şedadê ku di 5'ê gulana sala 2018'an de hate vekirin, ji 50 gundan re xizmetên tenduristiyê pêk tîne. Gundên dikevin xeta xizmetê ya navendê ji bajarokê El-Hedadiye dest pê dikin û heta bajarokê Qana digire nava xwe.
Navend ji şêniyan re xizmetên tenduristî û dermanan bê pere pêşkêş dike. Di navendê de 2 bijîşkên giştî, bijîşkekî diranan û 2 hemşîre dixebitin. Di navendê de her wiha ambulans û dermanxane jî hene.
Îbrahîm Ehmed wek hemşîre di navendê de dixebite û derbarê xebatên pêk tînin de ev tişt anî ziman: "Em xizmetên tenduristiyê ji derdora 50 gundan re pêşkêş dikin. Derman û pêwîstiyên tenduristiyê 24 saetan ji welatiyan re têne pêşkêşkirin."
Hena Mihemed ya ji bajarokê El-Erîşa da zanîn ku beriya navend were vekirin wan gelek zehmetî dikişandin û neçar diman ku nexweşên xwe bibin bajarê Hesekê ku derdora 40 kîlometreyan dûrî wan e…*ANHA*

## Ciwanên enternasyonal berê xwe dan Qendîlê



Ji bo ku destekê bidin çalakiya 'Mertalên Zindî' ya ciwanên Başûrê Kurdistanê ya li dijî dagirkeriya Tirk, komeke enternasyonal a ciwan berê xwe da herêmê.
Bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Welatparêz û Tevgera Jinên Ciwan 8'ê Hezîranê ber bi herêma Qendîlê ve meşek pêk hatibû. Ciwanên enternayonal ên ku bi mebesta piştgiriyê bidin çalakiyê çûbûn Silêmanî ber bi Qendîlê ve dest bi meşê kirin.
Beriya ku ber bi Qendîlê ve bi rê bikevin, endamê Tevgera Ciwanên Welatparêz Wilyam Berzencî got: "Li Başûrê Kurdistanê, li gel ciwanên enternayonal em ê serdana çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê bikin. Divê em hemû bi hev re li dijî êrîşên dagirker rawestin. Divê em xeyalên Tirkiyê ya dagirkirina Başûr pûç bikin û em hemû bi hev re divê li dij vê rawestin."

## Sewalkar êm depo dikin

Sewalkarên Girê Spî dest bi depokirina êmê pezê xwe yê demsala zivistanê kir.
Piştî ku cotkar dest bi berhevkirina berên xwe dikin, sewalkar dest bi berhevkirina kayê dikin.
Ji ber ku di vê dema salê de buhayê kayê erzan e, cotkar niha dest bi berhevkirin û kirîna wê dikin. Niha buhayê kayê li navçeya Eyn Îsa ya bi ser Girê Spî bi 40 lîreyên Sûriyê tê firotin. Lê belê di demsala zivistanê de kîlo digihîje 100 lîreyên Sûriyê. Hin cotkarên ku derfetên wan ên depokirinê hene, kaya ji zeviyên wan derdikeve, depo dikin û di demsala zivistanê de bi buhayê zêde difiroşin sewalkaran.
Gelek caran jî bazirgan jî kaya di bazarê de ji cotkaran dikirin û di demsala zivistanê de bi buhayên zêde difiroşin.
Sewalkarê bi navê Mihemed El-Îsa derbarê mijarê de diyar kir ku ew dema kayê berhev dikin û ji sewalên xwe re depo dikin û wiha dom kir: "Îsal cureya kayê ne zêde baş e, rewşa hewayê bandor lê kir, lê ji ber ku ka êmê sereke yê sewalan e, em neçarin depo bikin."…*ANHA*





# Dewleta Tirk li Efrînê êrîşî jinan dike

***Dewleta Tirk a dagirker li Efrînê kirinên xwe yên hovane bê navber didomîne. Jinên ji Efrînê ku ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk koçber bûne û niha li Şehbayê di kampan de dimînin diyar kirin ku dagirker bi taybet êrîşî jinan dikin gotin, "Emê heta dawiyê têkoşîna xwe bidomînin ta ku Efrîn rizgar bibe."***







Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Abdullah anî ziman ku hemleya Bagera Cizîrê berdewame û şer di navbera QSD`ê û çeteyên DAIŞ`ê bi dijwarî didome.
Pêngava Bagera Cizîrê ku di çarçoveya paqijkirina sînorê Sûriyê û Iraqê û gundewarên Hesekê ji çeteyên DAIŞ`ê destpê kiribû didome. Lîlwa Abdullah anî ziman ku pêngav didome û hedefa wan a yekemîn rizgarkirina şêniyên herêmê ye.
Lîlwa Abdullah têkildarî pêngavê agahî da û got: ″Pêngav ji du baskan dest pê kiriye. Baskê rojhilat û baskê rojava. Heyanî niha hêzên me yên baskê rojhilat 9 km bi pêşve çûne û baskê me yê rojava jî 13 km bi pêşve çûne. Heyanî niha gundê Til Hemîdî, Sefyan, Mezar Xebrî, Hicle, Şemas, Murcan, Ewdad û Um Mehfûr hatine rizgarkirin″.
Lîlwa Abdullah anî ziman ku li herêmê di navbera şervanên QSD`ê û çeteyên DAIŞ`ê şer dijwar qewimî ye û wiha berdewam kir: ″Di şer de çeteyên DAIŞ`ê li hemberî hêzên me çekên navîn û giran dide bikaranîn û heyanî niha hejmareke mezin ji çeteyên DAIŞ`ê hatine kuştin û gelek dîl ketine destê me, 5 tunelên wan hatine dîtin. ″
Têkildarî rizgarkirina sivîlan jî Lîlwa Abdullah wiha got: ″Hêzên me yê taybet ên girêdayî QSD`ê ji bo rizgarkirina şêniyên herêmê riyên taybet vekirin. Di wan riyên taybet de hejmareke mezin ji sivîlên herêmê ku çeteyan ew weke mertalên zindî bikardianîn, hatin rizgarkirin″.Lîlwa got: ″Çeteyên DAIŞ`ê bi hemû rê û rêbazan dixwazin li pêşiya pêngavê bibin asteng, destûr nadin gundiyan ku ji gundên xwe derkevin, erebeyên bombebarkirî li hemberî hêzên me bikartînin, li gundan jî mayînên lazer ên zû diteqin datînin û dixwazin li pêşiya pêngavê û rizgarkirina şêniyên herêmê bibin asteng."
Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Abdullah di dawiyê de anî ziman li hemberî mayînên lazer ên çeteyên DAIŞ`ê ekîbên rakirina mayînan derketine û jiyana sivîlan diparêzin…*ANHA*

## Emê heta dawiyê başûr biparêzin



Fermandara YJA STAR'ê Sorxwîn Zagros êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û berxwedana gerîla ya li dijî dagirkeriyê nirxand û got, "dagirkirina başûr wê ne hêsan be."
Fermandara YJA STAR'ê Sorxwîn Zagros bal kişand ser êrîşên artêşa Tirk û got, "Wê li her deverê berxwedana gerîla bê navber dewam bike."
Zagros got, "Artêşa Tirk hewl dide bi hemû derfetên xwe xaka Başûrê Kurdistanê dagir bike. Ev dagirkerî, ev êrîş ne tenê li dijî gerîla ye. Dewleta Tirk bi hemû hêza xwe dixwaze li Başûrê Kurdistanê serwer be. Lê ji her demê bêhtir gerîla bi moral û kelecaneke mezin li çiyayên Kurdistanê li ber xwe dide. Xwe parastin mafê gerîla ye."
Zagros wiha dewam kir: "Gerîla xwedî hunera şer û ezmûna bi salan e. Ev dagirkerî wê li Başûrê Kurdistanê pir bi hêsanî nebe. Gerîla wê mafê xwe yê parastinê bi kar bîne."
Fermandara YJA STAR'ê Sorxwîn Zagros di dawiya axaftinê xwe de got, "Artêşa Tirk ne tenê herêma Qendîlê, dixwaze tevahiya xaka Başûrê Kurdistanê dagir bike. Bi van êrîşan tenê gerîla nake hedef. Tevahiya civaka Başûrê Kurdistanê dike hedef. Weke gerîlayên Kurdistanê, em ê heta dawiyê li ber xwe bidin. Em ê gelê xwe û Başûrê Kurdistanê biparêzin."…*ANF*

## Wê faşîzm negihêje armanca xwe



Jinên Şengalê derbarê pêkanîn û êrîşên dewleta tirk ên li ser Efrînê de diyar kirin ku divê dewleta tirk axa Efrînê ya dagir kiriye terk bike û gotin: "Wê zihniyeta faşîst a ku Efrîn dagir kir têk biçe."
Jinên Şengalê derbarê pêkannîn û êrîşên dewleta tirk ên li ser Efrînê de anîn ziman ku ew ê hesabê pêkanînên qirêj ên ku li ser gelê Efrînê hat kirin û hîn tê kirin, bê pirsîn û gotin: "Erdogan kirinên ku bi destên çeteyên DAÎŞ'ê li Şengalê pêk anî niha bi heman zîhniyeta faşîst û qirêj li ser Efrînê pêk tîne. Wê hesabê van pêkanînên faşîst û yekperest bê pirsîn."
Jina bi navê Suad Hisên da zanîn ku temenê pergalên yekperest ne demokrasî her dem xezeb û şer afirandiye û got: "Îro Erdogan li Tirkiyê pergalek yekperest ava kiriye û kesên ku ne di fikra wî de bin tasfiye dikin û dixe girtîgehan. Erdogan bi heman şêwazê êrîşî Efrînê jî kir û niha li Efrînê bi destên çeteyên ku navê OSO li wan kiriye heman pergalê ava dike û di vê pergalê de koletiyê dîsa li ser jinê ferz dike. Divê di destpêkê de jin li dijî van pêkanînên Erdogan derkevin û di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de Erdogan têk bibin."Her wiha jina bi navê Emşo Eyo jî da zanîn ku jinên Êzidî wê serî li dijî pergala yekperest netewîne û got: "Bi êrîşan û bi kuştinê gelê Kurd tune nabin. Em bi hêztir dibin. Dema ku çeteyên DAÎŞ'ê ketin Şengalê û çeteyên OSO'yê jî ketin Efrînê bi piştgiriya Erdogan dest avêtin cihên pîroz û dîrokî. Ev yek pêkanînek dijmirovî ye. Ew ê Erdogan û hevkarên wî li ser her çar parçeyên Kurdistanê tu carî negihêjin armanca xwe."…*JINNEWS*

## Divê jin tevli karên civakî bibin



Jin heta niha di tevahiya civakan de ji ber zîhniyeta zilam a dagirker gelek zor û zehmetiyan dijîn. Li gel mêr û civakê wekhevî di navbera jin û mêr de tune bû lê belê piştî şoreşa Rojava jin xwe ji berê zêdetir birêxistin kir û di civakê de bûn xwedî rolekî girîng.
Li kantona Şehbayê kevneşopiyên ku jin di malê de bimîne, tenê xizmeta hevjînê xwe bike û zarokan xwedî bike, serwer e. Li hemberî van kevneşopiyan û çarenûsa ji bo jin hatiye diyarkirin, piştî şoreşa Rojava têkoşîn dest pê kir.
Herêma Şehba berî ku were rizgarkirin ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatibûn dagirkirin û ji berê zêdetir jiyan li jinan teng kiribûn. Bi rizgarkirinê re jin xwe li herêma Şehbayê birêxistin kir. Navend û saziyên jin hatin vekirin, dewreyên perwerde hatin birêxistinkirin, niha jî li Şehba jin tev li hemû xebatan dibin.
Yek ji van jinan ku tev li xebatan bûye Recai Himêdî ye. Himêdî berî 6 mehan tev li hilbijartinên meclisa navçeya Kefer Naya dibe û dibe cîgira hevserokên meclisê. Derbarê mijarê de Himêdî diyar kir ku li navçeya Kefer Naya cara yekemîn ew tev li hilbijartinan bûye û anî ziman ku jin û gelê navçeyê hêz dane wê. Himêdî anî ziman ku piştî ku ew rêxistin jinan nas kiriye cesareta wê zêde bûye û destnîşan kir ku jinên ereb bi rêya rêxistina jinên kurd li herêma Şehbayê pêşketine.
Her wiha Himêdî ji jinê herêma Şehbayê daxwaz kir ku tev li karên rêxistinbûnê bibin û civaka xwe pêşbixin…*ANHA*

## Jin di sporê de jî hêza xwe nîşan didin



Turnovaya ciwanan a voleybolê bi tura duyem berdewam dike. Wê du tîmên jinên ciwan di vê turê de bên pêşberî hev Kaptana tîma TJCM'ê Hilbîn Kilîm got: "Em jinên ciwan em ê hêza xwe di qada sporê de jî nîşan bidin."
Turnuvaya voleybolê ya di bin sêwana Tevgera Ciwanên Mexmûr (TCM) û Tevgera Jinên Ciwan ên Mexmûrê (TJCM) ê de li ser navê Şehîd Ferhat Goyî û Şehîd Nûpelda Amed ên di berxwedana Rojava de şehîd bibûn hatibû destpêkirin bi tura duyemîn berdewam dikera. Dê jinên ciwan ên Saziya Ciwanan û jinên ciwan ên Tevgera Çand û Hunera Mexmûrê bên pêşberî hev. Kaptana Tîma Jinên Ciwan a Saziya Tevgera Jinên Ciwan Hilbîn Kilîm derbarê maça wê bê lidarxistin de nirxandin kir.
Hilbîn diyar kir ku wan xwestiye weke jinên ciwan serkeftinên xwe ya di qada sporê de bidin nîşandan û wiha dewam kir: "Em û jinên ciwan ên navenda çandê em ê bên pêşberî hev. Aramca me ew e ku em bala jinan bikişînin ser sporê. Ji ber spor ne tenê ya mêran e, em jin jî dikarin xwe tê de pêşbixin û li wê qadê jî hêza xwe nîşan bidin."…
*JINNEWS*

## Jinên Kurd serhildêr in



Sema Yuce di 17'ê Hezîrana 1998'an de li dijî zext, zordestî û neheqiyan serî hildide û di 21'ê Adara 1998'an de çalakiya fedaî pêk tîne û li zindanê bedena xwe dide ber agir. Bi munasebeta salvegera şehadeta Sema Yuce Endama Rêveberiya Kongreya Star Arjîn Firat diyar kir ku Sema Yuce mînakek giranbiha ya têkoşîna doza azadiyê ye û got ku ew ji bo gelê Kurd sembol û nirxek pîroz e.
Sema Yuce berî ku çalakiya fedaî pêk bîne peyamekê dide gelê Kurd û dibêje: "Jina Kurd a ji ronahiya agirê azadiyê wê tevna serxwebûna Kurdistanê bihûne."
Endama Rêveberiya Kongreya Star Arjîn Firat anî ziman jinên Kurd di her qada jiyanê de li dijî faşîzm û desthilatdaran serkeftin û destkeftiyên mezin bi dest xistiye û got, "yek mînaka lehengên jinên Kurd jê Sema Yuce ye. Jinên Kurd serhildêr in. Tu carî bejna xwe li ber dijmin netewand û ew ê netewîne. Semayê ji bo jiyanek azad û serbixwe bedena xwe da ber agir. Bi çîrûska agirê wê gelê Kurd bi hêztir bû. Jinên Kurd serhildêr in."
Arjînê da zanîn ku Sema Yuce her dem ji bo doza xwe tu carî dev ji tevgera têkoşîna xwe berneda. Gelê Kurd jî ji wê feyz girt û niha bi milyonan Sema wekî çirûskek agir ji hêviya serîhildanê berxwe didin."…
*JINNEWS*

## Şandeya jinan serdana malbatên şehîdan kir

Şandeyeke jinan bi boneya cejna Remezanê serdana malbatên şehîdan ên li herêma Kefer Naya ya kantona Şehbayê kir.
Bi hevkariya komîn û meclisên herêma Kefer Naya ya kantona Şehbayê, endamên Yekitiya Jinên Azad yên kantona Şehbayê û Kongreya Star li kantona Efrînê di roja sêyemîn a cejna Remezanê de serdana malbatên şehîdan kir.
Di serdanê de şandeyê cejna Remezanê bi hêviya ku her kes vegere mal û warên xwe li malbatên şehîdan pîroz kir.
Her wiha jin û malbatên şehîdan kêfxweşiya xwe bi serdana rêxistinan anî ziman û diyar kir ku dê heta serkeftinê rêya şehîdên xwe bişopînin…*ANHA*

# Xêra dewleta Tirk ji başûr re tune ye

***Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn diyar kir ku armanca êrîşên dewleta Tirk li ser başûr ne tenê gerîla ye, li ser hemû Başûrê Kurdistanê gefa dagirkirinê heye. Engîn wiha got, "Di referandûma başûr de jî rastiya dewleta Tirk careke din hat dîtin. Ji bo faşîzmê Kurdê baş Kurdê mirî ye. Ji bo vê divê Kurd hemû li ber xwe bidin û yekîtiya xwe ava bikin."***

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn bal kişande ser êrîşên dagirker ên dewleta Tirk li ser başûrê Kurdistanê û got, "Armanca van êrîşan ne tenê gerîla ye, li ser hemû Başûrê Kurdistanê gefa dagirkirinê heye û êrîş li ser tevahiya Başûr e."

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn êrîşên dagirker ên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê û berxwedana gerîla ya li dijî artêşa dagirker a Tirk nirxand.Engîn li ser armanca tevgera dagirker a Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê, komkujiyên li Sûr, Cizîrê bi bîr xist û got, "Dixwazin êrîşê bibin ser cografyaya Kurd û demografiyê bilîzin. Êrîşên li dijî referanduma Başûrê Kurdistanê ya 2017'an jî tê zanîn. Di rojekê de nirxên ku hatine avakirin hatine desteserkirin. Li ber çav ê ku ev kirî her çendî dewleta Iraqê be jî, rêveberê vê yê esasî faşîzma Tirk e."Engîn bal kişande ser êrîşên dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê, pêvajoya guherînê ya Rojhilata Navîn dest nîşan kir û got, "dewleta Tirk dixwaze vê pêvajoyê li gorî berjewendiyên xwe biguherîne."

Engîn diyar kir êrîşên dagirker ên li ser Biradostê li ser vê zemînê pêk tên û armanca êrîşê ne tenê gerîla ye, li ser tevahiya Başûr gefa dagirkirinê heye."

Engîn got, "di serî de gelê Başûr, divê çar parçeyên Kurdistanê ji bo êrîşên dagirker hazir bin, faşîzm ne tenê ji hêla leşkerî ve berê xwe daye Başûr lê her wiha ji hêla siyasî, civakî ve jî berê xwe daye Başûr."

Engîn bi bîr xist ku gerîlayên HPG-YJA Starê hêza parastinê ya hemû Kurdistanê ne, bal kişande ser berxwedaniya gerîla ya Bakur û Başûr ya li dijî dewleta Tirk a mêtinger û got, "Berxwedana gerîla hewldana li dijî her cure faşîzmê ye. Gerîla bi vê bîreweriyê şer dike û li ber xwe dide. Mînaka vê ya herî berbiçav qada Biradostê ye. Li Biradostê gerîla her roj çalakiyan dike."

Engîn wiha dewam kir, "Lê berxwedan divê tenê bi gerîla re sînordar nemîne, divê civak jî li ber xwe bide. Di qada siyasî de bersiva herî baş a li dijî faşîzmê hilbijartina 24'ê Hezîranê ye. Di qada civakî de bersiva herî baş a li dijî êrîşên dagirker serhildan in. Berxwedaniya gerîla di demên pêş de zêdetir wê geş bibe û bidome."

Engîn her wiha got, "PKK weke van 40 salên dawî niha jî li dijî êrîşên dagirker, mêtinger ên faşîzmê wê bi berxwedaniyeke giştî bersivê bide."

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn diyar kir faşîzm bi teknîka herî pêşketî êrîşê tîne ser Kurdistanê, bal kişande ser bêdengiya hêzên navneteweyî ya li ser êrîşên faşîzma dewletî ya Tirk a li Başûr û got, "ev bêdengî tê maneya pejirandina êrîşên dagirker." Engîn diyar kir DYA,



Rûsya, welatên Ewropayê li gor berjewendiyên xwe ev êrîş pejirandine û ev jî rewşeke têkildarî şerê cîhanê yê 3'yan e.

Kasim Engîn bal kişande bêdengiya Barzanî û PDK'ê ya li ser êrîşan, diyar kir ku partiyên siyasî yên Başûrê Kurdistanê divê xwedî helwest bin.

Engîn bi bîr xist ku êrîş ne tenê li ser Başûr, li ser hemû Kurdistanê ye û diyar kir ku divê demildest yekîtiya neteweyî ya Kurd were danîn û bi vî rengî ew ê bikaribin pêşî li êrîşên dagirker û mêtinger bigirin.

Engîn got, "divê partiyên siyasî yên Başûr rastiya dijmin baş nas bikin." Engîn helwesta dewleta Tirk a li hember referandumê jî bi bîr xist û got, "Ti xêra dewleta Tirk ji pêkhateyên Başûr re nîn e. Ji bo faşîzmê Kurdê baş Kurdê mirî ye. Ji bo vê divê Kurd bi giştî li ber xwe bidin. Ji bo vê jî hewceyî bi yekîtiya neteweyî heye."…***ANF***

## Divê gelê lîstikên Erdogan pûç bike




Namzeta HDP'ê ya Mêrsînê Fatma Kûrtûlan, bang li gel kir ku biçe ser sindoqan. Kûrtûlan bal kişand ser gotinên Erdogan ku gotibû divê HDP di bin bendê de bimîne û got: "Erdogan li ser sûc hat zevtkirin."

Namzeta HDP'ê ya Mêrsînê Fatma Kûrtûlan ku di hilbijatina giştî ya 2007'an de bi awayekî serbixwe hat hilbijartin, diyar kir ku li Mêrsînê di warê şideta jinê, kedxwarî, betalî û hawirdorê de gelek pirsgirêk hene û eger ew bên hilbijartin ew ê tevî gelê bajêr bajarekî ku mirov bikaribe lê bijî ava bikin.

Kûrtûlan, diyar kir ku li hemberî îtiifaqa AKP-MHP'ê partiya wan îtifaqa gelan e û got: "Xebatên em bi rê ve dibin, nîşan dide ku em partiyeke hêviya gelan e."

Kûrtûlan, diyar kir ku herkes bandoreke neyînî ji kirinên pergala navendî digire û yek ji van bajaran jî Mêrsîn e. Kûrtûlan got: "Ji ber şert û mercên şer yên berê gelek kurd neçar man koçî Mêrsînê bikin. Bajarekî ku gel û baweriyên cuda lê dijîn, lê belê ligel vê jî bajarekî ku polîtîkayên qirêj lê tên kirin. Mînak; di warê tenduristiyê de ev nexweşxaneyên bajaran veguherîne zilmê. Helbet dema em bên hilbijartin em ê tevî gelan hewl bidin van pirsgirêkan çareser bikin."

Kûrtûlan, bal kişand ser gotinên Erdogan ku di vîdeoyeke li ser medyaya civakî de hatibû parvekirin digot divê HDP di bin bendê de bimîne û got: "A rast ev ne cara ewil e. Erdogan tim bi keya, qeymeqam û waliyan re hevdîtinê çêdike. Ma dê çi karê serokomarekî bi keyayan re hebe? Yanî herî zêde Erdogan Qanûna Bingehîn bin pê dike. Erdogan nelirêtî kiriye û sûc kiriye. Her roj ji bo hin kesan gazî dozgeran dike, lê di esasê xwe de divê êdî ji bo xwe bang li wan bike. Hîn jî ji bo namzetiya Demîrtaş neyê qebûlkirin bang li wan dike. Di axaftina wî ya li ser medyaya civakî belav bû de, bi awayekî eşkere gotiye divê HDP di bin bendê de bimîne. Yanî dibêje nelirêtiyê bikin. Li ser sûc hat zevtkirin. Ji bo vê yekê çi hewce be divê bê kirin."

Kûrtûlan, bilêv kir ku li pêş AKP'ê astengiya herî mezin HDP ye û got: "Îktîdar pêşeroja xwe di hiştina bin bendê ya HDP'ê de dibîne. Ji bo vê yekê Demîrtaş di girtîgehê de radigire. Ev gotinên wî ji bo me di bin bendavê de bihêle, tên wateya ku dê serî li her cure hîle xurdeyan bide. Em ê jî li hemberî vê bitêkoşin û vê lîstikê pûç bikin. Ji bo vê divê gelê me biçe ser sindoqan û xwedî li dengên xwe derkeve."

## Tirs ketiye nava dilê dewletê




Namzetên HDP'ê û nûnerên rêxistinên girseyî yên demokratîk ên li Enqereyê li hev rûniştin. Parlamenterê HDP'yî Mîthat Sancar diyar kir ku ji ber hewldanên taybet ên AKP'ê, pirsgirêka bendê hê li ber wan e û ji bo ewlekariya sindoqan hişyarî da.

Rêxistina HDP'ê ya Enqereyê, nûnerên rêxistinên girseyî yên demokratîk û komeleyên herêmî li hev civand. Namzetên parlementeriyê Fîlîz Kerestecîoglû, Velî Saçilik û Nûray Turkmen tevî Parlamenterê Mêrdînê Mîthat Sancar tevlî kombûnê bûn. Di destpêkê de sînevîzyona ji axaftinên namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş dest pê kir.

Parlamenterê Mêrdînê yê HDP'yî Mîthat Sancar bi zimanên Erebî, Kurdî û Tirkî silav da beşdaran û ji bo hilbijartinên 24'ê Hezîranê got, "Ev yek meşa 7'ê Hezîranê ye." Sancar got, "Yên ku ditirsin ne tenê Erdogan û AKP ne. Tirsa HDP'ê ketiye dilê hemû kadroyên dewletê. Lewma encamên hilbijartina 7'ê Hezîranê nas nekirin û dest bi rijandina xwînê kirin ku ev yek taybetmendiya wan a bingehîn e. Bi her awayî dest bi derewan kirin. Ji bo vîna gelan talan bikin, dest bi derew, talan û rijandina xwînê kirin."

Sancar got, "Bi rijandina xwînê, bi derew û destesekirinê desthilatdarî bi rê ve naçe" û wiha dewam kir: "Tevî ku her tişt dagir kirine, dikin nakin nikarin bi rê ve bibin. Desthilatdariya li ser xwînê û derewan ava kirine, lewma nikarin bi rê ve bibin. Ji hilbijartinên 7'ê Hezîranê û vir ve ji bo HDP'ê bi temamî tine bikin, serî li her rê û rêbazê dan. Hevrêyên me dîl girtin, wekîltiya wan betal kirin. Tevî zext û zordariyê jî HDP li ser piyan e. Ji ber vê yekê bi hêrs dibin. Em ne tenê li ser piyan e. Em gav bi gav mezin dibin."Sancar li ser ewlekariya hilbijartinê jî got, "Dengdêrên me yên biçin ser sindoqan wî baş nas dikin. Desthilatdarî li pêşiya dengdana hilbijêrên me dibe asteng. Hewl dide bike ku dengdêrên me nikaribin biçin ser sindoqan. Dek û dolab ji van kêm nabin. Hebûna vê desthilatdariyê derewîn e. Ji bo HDP li bendê bialiqe çi ji destê wan tê dikin. Lewma divê her kes xwedî li sindoqan derkeve û bi berpirsyariya ewlekariya sindoqan rabin."

## Parastina Kurdistanê erka hemû Kurdan e

Welatiyên ji Bakurê Kurdistanê ku li dijî dagirkeriya Tirk serdana mertalên zindî yên li Qendîlê kirin bang li gelê Kurd kirin ku tev bihevre xaka Kurdistanê biparêzin û gotin, "Me çawa DAIŞ binxistibe, divê em bi heman awayî vê desthilatiya AKP-MHP'ê jî binbixin. Parastina Kurdistanê erka tevahî gelê Kurd e."

Welatiyên ji Bakurê Kurdistanê ku serdana Mertalên Zindî yên li Qendîlê kirin û cejna wan pîroz kirin.

### DIVÊ EM DESTHILATA AKP'Ê TÊK BIBIN

Endamê Rêveberiya Meclîsa Bakur li Başûrê Kurdistanê Salih Baykar diyar kir ku ew piştgiriyê didin çalakiya mertalên zindî û wiha axivî, "Desthilatiya AKP-MHP'ê di vê dema hilbijartinên Tirkiyê de ketiye tengasiyeke mezin."

Baykar diyar kir ku belkî dewleta Tirk karî bi awayeke hovane bajar û bajarokên Kuridstanê wêran û talan bike lê, wê nikaribe çiyayên Kurdistanê wer bi rehetî wêran



bike. Me çawa DAIŞ'ê binxistibe, divê em vê desthilatiyê jî bin bixin. Rûyê wê yê rast li Pirsûsê careke din derket. Ji ber vê pêwîste tevahî gelê Kurdistanê li hember vê dagirkeriya faşîzan têbikoşe û ser hilde."

### PARASTINA KURDISTAN ERKA ME YE

Endamekî din yê Meclîsa Bakur Tehsîn Yildirim jî diyar kir ku ew dema hatin Qendilê û serdana ciwanên bûne mertalên zindî kirine hêz û moraleke mezin ji wan girtine û wiha axivî: "Parastina axa Kurdistanê erka tevahî gelê Kurd e. Dewleta Tirk hewl dide bi êrîşên hovane vîna gelê Kurd bişîkîne lê, wê nekare vêya serbixe, sekna gelê Kurd ya li hember vê hovîtiyê diyar e."…***ROJNEWS***



# Em ê ji sekna xwe venegerin

***Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş, ji rojnameya Le Monde ya Fransayê re gotarek nivîsî û diyar kir ku ew li ser daxwaza Ergogan hatiye girtin û wiha got, "Berdêla xwe çi dibe bila bibe, bi navê xwe, ez ê ti carî ji sekna xwe ya mûxalîf a ji bo gelê xwe venegerim."***

Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş, ji rojnameya Le Monde ya Fransayê re gotarek nivîsî.

Demîrtaş got, beriya niha bi salek û 8 mehan, ew ji Amedê ku malbata wî lê ye hate girtin û bi 1700 km dûrî malbat û hevalên xwe, li girtîgeha Edîrneyê hatiye bicihkirin.

Demîrtaş diyar kir ku niha li girtîgehên Tirkiyeyê bi deh hezaran mirov hene ku ji ber mafê xwe yê azadiya raman û rêxistinbûnê bi kar anîne weke 'terorîst' hatine îlankirin û girtin.

Selaheddîn Demîrtaş bi bîr xist ku yek ji şeş namzetên Serokkomariyê ew e û wiha dewam kir: "Di dîroka siyasî ya cîhanê de kêm lîderên siyasî hene ku ji girtîgehê bûne namzetê Serokkomariyê. Tevî ku min nedixwest bi vî rengî bêm hişê mirovan jî, yek ji wan lîderan ez im. Lê belê ev rewş ne tercîha min e, daxwaza Erdogan e. Piştî ku hatim girtin bi salekê qet ez dernexistin pêşberî dadgeriyê. Piştre jî tenê du caran. Li ser darizandineke adîl tiştekî nabînim. Li gorî qanûna heyî diviyabû ji destpêkê ve negirtî bihatima darizndin. Niha jî li gorî daxwaza hikumetê dema darizandina min dikare bê dirêjkirin an jî bi



sedan sal cezayê girtîgehê li min bê birîn."

Demîrtaş destnîşan kir ku ew ji dadger û dozgerên ji her kesî bêhtir ji Erdogan ditirsin, edaletê hêvî nake û got, "Tevî ku baweriya min a edaletê ya ji saziyên dadgeriyê qels e, baweriya min a bi gelên Tirkiyê gelekî xurt e ku wê hem xwe hem jî dadgeriyê azad bikin. Çar namzetên li derveyî Erdogan dan xuyakirin ku divê negirtî werim darizandin. Ji aliyê gel ve rewş hîn tevlîhev e. Eger li gorî îdîayên ku Erdogan her roj di mîtîngan de tîne ziman sûcdar bim, wê çaxê çawa dikarim bibim namzet. Na eger ne sûcdar bim, çima nayêm berdan. Ev pirs di hişê mirovan de ne. Bersiva vê nakokiyê gelekî hêsan e: desthilatdarî baş pê zane ku eger îro serbest bim, mîna 7'ê Hezîrana 2015'an bi mûxalefeteke xurt, ez ê xewn û xeyalên otorîter ên Erdogan lê bikim kabûs."

### YA DÎKTATORÎ YA JÎ DEMOKRASÎ

Demîrtaş diyar kir ku bi derfetên kêm jî be ew hewl dide siyaseta Ewropayê ji nêz ve bişopîne û got, "Mixabin bi têrkerî destekê nadin welatên Tirkiyê yên li girtîgeha nîv-vekirî ji bo azadiyê têdikoşin. Di hilbijartinê de wê dengdan li ser dîktatorî ya jî demokrasiyê bê dayin. Eger em pêvajoya endametiya Yekîtiya Ewropa deynin aliyekî jî, her pirsgirêkên aborî, ewlekarî û penaberan ên li Tirkiyeyê diqewimin yekser bandorê li Ewropayê dikin. Lewma daxwaza welatên Ewropayê bi xweşbînî pêşwazî dikim ku ji aliyê siyasî û aborî ve Tirkiyeyeke aram dixwazin. Lê mixabin hîn jî nabînin ku Erdogan çavkaniya nearamiyê ye. Hikumetên Ewropayê di berdêla nedîtina kiryarên antî demokratîk ên Erdogan dibe ku di mijarên aborî û penaberan de ji bo pêwîstiyên xwe yên demkin bersiv dîtibin. Lê belê ev rêveçûn nabe ku bidome. Krîza siyasî ku Erdogan bi sorkirina gel û neteweperestiyê rê li ber vekiriye, ber bi krîzeke aborî ya giran ve çûye. Eger Erdogan şeva 24'ê Hezîranê bi dek û dolaban ragihîne ku di hilbijartinê de bi ser ketiye, ev yek wê krîzan girantir bike.

Demîrtaş işaret bi gefên darvekirinê yên Erdogan jî kir û got, "Berdêla xwe çi dibe bila bibe, bi navê xwe, ez ê ti carî ji sekna xwe ya mûxalîf a ji bo gelê xwe venegerim. Mîna min bi dehan milyon mirov li Tirkiyê hene ku ji bo demokrasî û aştiyê têdikoşin. Ez zanim ku ew mirov wê ti carî vê rêveçûna otorîterbûyînê qebûl nekin. Lewma encamên hilbijartinê çi dibin bila bibin, em ê têkoşîna xwe ya ji bo wekhevî, edalet û azadiyê bidomînin."

## DYA û Dîplomasiya Kurd



Burhan ERDEM

Niha em di pêvajoyekê de ne ku, rojeva hilbijartinên Tirkiyeyê hertişt li dû xwe hiştiye . Mitleqa dê encama serkeftin an jî binketina HDPê gelekî girîng be, wê bi xwe re gelek guherînan bîne û wê tesîrê li karê kurdan bike. Lê divê awayê nêrîn û vegotina li cîhana rojava ya pirsgirêka kurd biguhere. Riya vê jî dîplomasiye.

Dîplomasiya gel a kurdan dabûn pêşiya xwe, di pêvajoya Efrînê de gelekî serkeftî bû. Heta ez wê jî bêjim, ji hemû qadên têkoşînê zêdetir berhem anî. Niha tişta divê were kirin ew e ku, ew bayê rabûbû neyê rawestandin. Çimaniya vê yekê tê zanîn, çawaniya wê jî êdî girêdayî qanihkirina mirovan e.

Li Ewrûpayê tesîreke mezin a dîplomasiya gel a kurdan çêbû. Bi ya min niha dora kolana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye Mirov dikane gelek li ser nêrîn û berjewendî û hwd. yên Amerîkiyan spekulasyonan rêz bike û bi kirinên wê yên li dijî kurdan binê van gotinan dagre, arguman têra xwe hene.

Jixwe Kurdê bakur tucarî ji DYA'yê hesnekiriye, -mîna yê Başûr heta beriya referandûmêlêbelê tucarî ji DYA'yê nefret jî nekiriye. Tevgera wê jî DYA'yê nekiriye hedef û êrîşek pêk neaniye. Li hemberî vê nêzîkatiya -ka ez bi gotina 'nutur' binavînimkurdan, dijminahiyeke mezin a DYA'yê heye. Tevî vê jî kurdan wê nêzîkatiya han neterikandin. Dijminahiya DYA'yê nekirin. Û ez di wê baweriyê de me ku tevgera kurdan dikanîbû zirareke mezin bidana berjewendiyên DYA'yê. Lê nekir. Ez gihaştime wê qinetê ku ewê li tu deverê zirarê nede jî. Rayedarên amerîkî vê yekê baş dizanin.

Dîsa ew dizanin ku wan nirxên kurdan her kiriye hedefa xwe û di nava van nirxan de ji bo kurdan ya herî li pêş Rêberê wan e. Ji vî alî ve herçiqasî dijminahiyê nekin jî, kurd li DYA'yê naborin. Jixwe weke doh di bîra me de ye : Li kêleka wî Serokwezîrê Tirk Erdogan, Serokdewlet Bush gotibû tevgera azadiya kurd dijminê wan e jî.Yê beriya wî, Clinton fermana komployê mohr kiribû û Madeleina Albrightê weke wezîra wî ji hemû dewletan re gotibû gereke Ocalan li Ewrûpayê qebûl nekin. Mirovê Amererîkî berê wisa hatibû dagirtin. Pişt re jî helwesta rêveberiyaDYAyê hinekî guherîbû. Obama di hevdîtina xwe ya bi Ahmet Turk re de,îşareta vê guherînê dabû. Lê gelekî kifş e, ewqasî zelal e ku, j ibo rêveberiya DYAyê beriya kurdan, ew dewletên dagirkerên welatê me tên. Berjewendiya wan ji bo wan dewletan pêşdetir e.

Ji bo şikandina vê yekê jî, divê mirovê kolanê yê Amerîkî ji maf û azadiyên tune yên kurdan were haydar kirin. Tişta li Ewrûpayê di van salên dawî de hate kirin ev bû û eger li ser were sekinîn rê û rêbazên xwegihandina kolana Amerîkayê peyda dibin,

## Emê lîstika qirêj xera bikin



HDP mîtîngên ji bo hilbijartina 24'ê Hezîranê didomîne. Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Cizîrê beşdarî mîntîngê bû.

Temellî di mîtînga Cizîrê de axivî û got, "Ew ê ev dewran çep bizivire. Em werin ba hev. Heke HDP di 24'ê Hezîranê de bi ser bikeve, ew ê pêşiya Tirkiyê were vekirin."

Bi tevlêbûna Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Cizîrê mîtîng hate lidarxistin. Ji Şirnexê û hemû navçeyên derdorê, bi deh hezara beşdarî mîtîngê bûn.

Temellî di mîtîngê de got, "Di 24'ê Hezîranê de em ê ji vê desthilatdariyê pak bibin. Em ê di 24'ê Hezîranê de dawiya vê pergala zilmê bînin.

AKP her demê dijminatiya HDP'ê kir. Di meha Remezanê de jî nefreta xwe domandin. Herî dawî li Pirsûsê provakasyon kirin. Ji ber vê provakasyona wan mirovan jiyana xwe ji dest dan. Her kes dizane ku ev bûyer çawa pêk hatiye, lê Erdogan HDP sûcdar kir. Ew baş dizanin ku li nexweşxaneyê çi bûye. Lê dixwazin mirovan bixapînin.

Ma li ku derê hatiye dîtin ku bi çekan xebata hilbijartinê hatiye kirin. Em jî diçin serdana esnafan. Carinan bi destê me nagirin û me rexne dikin. Em dibêjn serçavan û em ji wê derê derdikevin. Lê ev kes bi çekan guleyan li dikanê direşînin. Ev tişt divê di demeke kurt de derkeve holê. Divê sûcdar werin girtin. Beriya hilbijartinên 1'ê Mijdarê û 7'ê Hezîranê jî bi heman lîstikan derdikevin pêşiya me. Me ew roj ji bîr nekirin. Kesên ku tehamulî encamên hilbijartina 7'ê Hezîranê nekirin, komkujiya Pirsûsê kirin. Niha jî bi senaryoya Qendîlê derketine holê. AKP dizane ku bi senaryoyên şer dikare li ser pêyan bimîne.

Êdî demê zivirîna vê çerxê hatiye. Êdî dema wê hatiye ku ev welat ji vê hişmendiyê rizgar bibe. Eger HDP bi hêz di 24'ê Hezîranê de biçe parlemetoyê, wê pêşiya Tirkiyê vebe. Li Amedê gotibûn 'Pirsgirêka Kurd nîne' Heta pirsa Kurd çareser nebe, ti pirsgirêk çareser nabe. Werin em mil bidin milên hev welatê xwe demokratîk bikin.

Ji bo hilbijartinê demek pir kin maye. Em ê bi hev re xwedî li sindoqên xwe derkevin. Em ê deng bikar bînin û nevegerin malê, xwedî li dengê xwe jî derbikevin. Em ê vê lîstika qirêj bi hev re xirabikin. Em ê bi teqez bi serkevin. Wê demokrasî bi ser keve. Ji bo wê dengek ji bo Demîrtaş yek ji bo HDP'ê."

## Endamên Eniya Neteweyî îro diçin Qendîlê



Eniya Neteweyî wê li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk îro bi heyeta KNK'ê re biçe Qendîlê.

Desteka ji bo Mertalên Zindî ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk roja 8'ê Hezîranê li Qendîlê ji aliyê ciwanan ve dest pê kir, zêde dibe.

Endamên Eniya Neteweyî ya li dijî dagirkeriyê ku nivîskar, aktîvîst, alimên olî û siyasetmedar jî di nav de ne, ji bo destekê bidin çalakiya mertalên zindî ya ciwanan wê biçin Qendîlê. Eniya Neteweyî wê bi heyeta KNK'ê re biçe Qendîlê.

Ji Silêmanî, Germiyan, Helebçe, Hewlêr û gelek herêmên din, wê girseya gel berê xwe bide Qendîlê. Girseya gel wê îro danê sibehê saet 7'an bi rê bikeve û danê nîvro bigihêje Qendîlê.

Endamên Eniya Neteweyî wê li Qendîlê daxuyaniyê bidin çapemeniyê.

## 30 pêşmergeyên li dijî dagirkeriyê derketin hatin girtin



Hat ragihandin ku 30 pêşmergeyên girêdayî Wezareta Pêşmergeyan, ji ber ku li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk derketine, hatine girtin. Hat gotin ku di nava pêşmergeyên hatine girtin de payebilind jî hene.

Li gorî zanyariyên çavkaniyek taybet ê li Hewlêrê, di nava Wezareta Pêşmergeyan de, 30 pêşmerge li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ku li ser Başûr dimeşîne nerazîbûn nîşan dane.

Çavkanî ragihand ku li ser vê yekê 30 pêşmerge hatine girtin. Heman çavkanî diyar kir ku di nava van pêşmergeyan de yên payebilind jî hene…***ROJNEWS***